Di xwîndingeha me da şahiyeke taybetî

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Pêncşem, 24ê September sala 2009an bû. Rojeke pir-pir xweş taybetî bû. Bi dehan reng li dora hev kom bibûn û dîmenekî pir bedew û rengîn afirandibûn.

Ji min ra ew roj xweştrîn roja sala 2009an bû. Di vê rojê da li xwîndingeha WIPA li bajarê Düsseldorf bo cara 3 mîn festîvala kulturî hate lidarxistin. Hema ji serê sibê etmosfêrê xwîndingeha me hatibû gûherandin. Li ber çavên min her tişt bedew û nû bû. Te digo qey sefîrên hemû parzemînên vê cîhanê li dora hev kom bûne û destê dostiniyê dane hev!. Hesreta ku bi sedan sale gelek kes bi xweziya wê dijîn. Wê rojê şahiyeke wisa xweş li darket ku min hemû xemên çend sal dûriya ji welat û malbata xwe ji bîr kirin. Riheke nû ket nava laşê min û hêzeke mezin di liv û lebata min da peyda bû. Hîvîyên mezin di mejiyê min da çêbûn. Ez bawerim hemû kesên ku wê rojê li wê şahiyê amade bibûn, xwedî rewşeke weke ya min bûn. Çimkî rûyê herkesî geş û lêvên wan jî bi ken bûn. Her rengek xwedî nasname û zimanê xwe bû. Hemû felsefe û mesaja ku birêveberên vê şahiyê didan me ji hev hezkirin û naskirina hev bû. Gelo ma tiştek ji vê armancê mezintir û pîroztir heye ku mirovên rû erdê bi bê ferq û cudatî ji hev hez bikin?!

Ji roja 5ê „Juni"ya sala 2009an ku mamostaya me rêzdar Olga Lutz bi rûyê xwe yê xweş û lêvên bi ken dest dersgotinê kir, li ser şahiya ku berê jî li mektebê hatibû çêkirin, axivî. Behsa armancên li darketina festeke wiha kir. Dema li ser şahiya sala 2008an diaxivî, heycanek an

jî keyfxweşyek di deng û çavên wê da xuya dibûn. Hemû dîwarên oda me tejî fotoyên rengîn bûn. Ew tev yên şahiya sala berê bûn. Hunera rêzdar Lutz li der û dîwarên xwîndingeha me dibarîn. Vê rewşê ez bi rastiyekê hesandim ku Frau Lutz ji karê xwe pir hez dike. Ez di wê baweriyê da me ku karê dersbêj dikin berdewama karê pêxemberane ku ji aliyê Xudê ve ji bo rênimoniya mirovên civakê hatibûn wezîfedar kirin. Di çavê min da mamostayên ku bi hez û evîneke bêhempa karekî wiha dikin, ji pêxembera ne kêmtrin. Di rewşa tevlîheva cîhana îro da ku insan têda sergerdan û bêhîvî ne, bargiraniyeke mezin dikeve ser milên dersbêjên vê cîhana biçûk. Tenê ew dikarin bi ked, şîret û kena xwe gulên çilmisî careke din geş û ji mirinê rizgar bikin.

Dema kesek nû li welatekî din dest bi jiyanê dike, elbete pêwîste ku civak û dîroka wî welatî jî nas bike. Naskirina adet, orf, qanûn û bi giştî sîstema wê dewletê ji mêvanê nû ra pêwîstiyeke mezine. Hingî deriyên nû li ber mirov vedibin û jiyaneke nû destpêdike. Kursên "integration"ê bo

armanceke wiha hatine danîn. Berî her tiştekî hînbûna zimanê Almanî bi serê xwe dibe sedema avêtina pêngavên mezin. Kilîla deriyê mezin li vira dikeve destê herkesî. Bi bê vê kilîlê mirov li vira gêj û hêre. Çavgirtî û lale. Kesên kerr, kor û lal jî li her derê serbarin û mirovên pozîtîv nînin. Di rewşeke wiha da êş û elemên jiyana li xerîbiyê zêdetir dibin. Frau Lutz bi pirensîpên xwe yên taybetî ji mera şansekî mezin bû ku gelek bi dilsozî û Toleranz dixwest em tev di naskirina civaka Alman, xwîndina xwe û hînbûna zimanê Almanî her roj ji roja berê bêtir pêşbikevîn.

Dema festa me ya îsal destpêkir, min heya hingî nedizanî ku di xwîndingeha me da ewqas êtnîkên ji welatên cur bi cur hene û wiha rihet hatine ba hev!. Birêveberên xwîndingeha WIPA bi dilekî berfireh pêşwaziya karekî wiha kirin. Ew bixwe jî hatin nava me û bi hezeke bêdawî li me guhdar kirin û pirsên balkêş pirsîn. Wan dixwest di wê roja taybetî da kultur, adet û orfên me baştir nas biken. Ev bi serê xwe rêyeke teşwîqkirinê ye ku rengê jiyana me jî diguherîne.

Di wê roja geş da kesên ji welatên: Afghanistan, Philippin, Spania, Irak, Iran, Gana, Äthiopien, Ukrain, Russlan, Polen, Morokko, Sudan,Türkei, Argentinien, Nigeria, Tunesien, Siriya, Ägypten, Brasilien, Senegal Gambia, Congo, Algeria, Kasachstan, Pakestan, Indien, Mexiko, Bangeladesh, China, Srilanka, Kamerun, Somalia, Thailand, Lebanon û Kurdên çar perçên Kurdistanê jî amade bibûn.

Bername ji hêla mamotayan ve bi nasndina karên ku diviyabû wê rojê bêne kirin, destpêkir. Xwarinên gelek xweş û rengîn li ser maseyan hatibûn danîn. Salat û fêkiyên cur bi cur jî li her derê dihatin dîtin.

Karê yekê ku ji herkesî ra balkêş bû reqs û muzîk bû. Her komekê bi kincên xwe yên netewî li pêşberî kesên din bernama xwe pêşkêş dikirin. Reqsa gelên Afrîka rengîn û nermiya stran û awazên wan bi kincên rengîn xweşiya bihara Kurdistanê dianî bîra min. Du kesa jî reqsa Rusî bi muzîkek rîtmîk û tund pêşkêş kirin. Ji hêla çend kesan ve jî hem stran hatin gotin û hem jî bi entûrmentalên weke Gitar û Org muzîk hate lêxtisn. Nasnama muzîka hinek netewan wê rojê cara yekê bû ku min dibihîst. Dewata Kurdî bi kincên pir bedew û rengîn riheke nû dabû şahiya me. Ji çar aliyên Kurdistanê jin û mêra destê hev girtibûn û bi melodiyên ritmîk çend curên dewatên xwe yên folklorîk pêşkêş kirin. Careke din çanda Kurda ya dewlemend di dilê Ewropa da jî rûyê xwe yê bedew daxuyanîkirin.
Pêşangeha kincan(Modenschau) ji hêla Frau Memoonah Zahed û Herr Oliver Twumasi va hate pêşkêş kirin. Wê rojê kincên Kurdî, Afganî, Rusî, Philipinî, Afrikayî û hwd pir rengiya çanda cihana me ya mezin raxistibû ber çavan.

Ger karekî wiha bibe kultureke dayîmî, elbete salên piştra dikare bi awayekî mezintir û dewlemendtir li darkeve.
Di festa îsal da tevî ku em tev şad û keyfxweş bûn, lê mamostayên me deqeyekê jî bêkar nedisekinîn. Ji wan ra rojeke tejî westiyan û ji mera jî rojeke tejî xweşî û dilxweşî bû. Ji bona wê jî çiqas ku em ji dil û can

sipasdarê mamostaya xwe: Frau Olga Lutz, Herr Lutz, Frau Jung û kesên din bin, elbete dîsa jî kême.

Di wê roja taybetî da zimanê me teva vebibû. Kesên ku nedikarîn biaxivin jî bi îşare û nêrînên xwe bi hevra diaxivîn. Welhasil ez bi tena serê xwe nikarim li ser hemû xwşiyên wê roja pîroz binivîsim. Hîvîdarim hevalên din jî wek bîranîn tiştekî li ser wê rojê nejbîrkirî binivîsin.

Çend wêneyên dema şahiyê: